يملأني ضجيجا
تعال وراقصني
رقصة المطر
لا تبتلل برويك
عند الغروب
أغمض عيني
ليحتوي عناق عطرِكَ
إحتواء
وليس إشتهاء

- ٢ -

تتعرق الأحرف في يدي
قبل ان تجتاز
دمع قلبي
وتترجم دون خوف أو بكاء
في برائن شعري
احكيها لك بحبات المطر
واختصرها
بضمة وقبلة

- ٣ -

موجة خطواتي نحوك
اختلط النور بالظلام
تعثرت الذاكرة
بترباق الصمت
وتمزق معطف الأحلام
عند الغروب.. بلا لقاء ...!!!



كلارا أوبليغادو/الترجمة عن الإسبانية: كاميران حاج محمود

فلتنفج أساريرك، لا تثيري انتباه أحد، ولا تبكي فليس عندنا مناديل، وما من أحد سيواسيك. لا تتأهري. فالصمت هو خبز يابس يجتاز حنجرتنا.

لا تسالي ولا تحكي لي مشاكلك، فلدي ما يكفيني. سنكبرين وتصبحين جميلة، سيسهل عليك أن تجدي زوجاً، فالرجال يذهبون إلى ما يذهبون إليه. سيكون شعرك مسبلاً ولماعاً، وستكون عينك عميقتين مثل بئرين. ولا تقولي لذلك الشاب الذي ستلتقين به من نكون نحن الاثنان، لا تحكي له قصتنا، أبداً لا تنطقي بالحقيقة. دعيه يفتح ذراعيه ويهددك كما لو كنت حمامة، لكن ضمي جيداً رجلك.

* Clara Obligado قاصة وروائية أرجنتينية من مواليد ١٩٥٠ وتعيش في إسبانيا منذ عام ١٩٧٦. صدر لها عدة مؤلفات من بينها «ابنة ماركس» وإذا كان رجل حي يجعلك تبكين».

إياك أن تنبسي بحرف حين تصعد إلى السفينة، لا تدعي البحر يوقّع بك، لا تنظري إلى السماء الشاسعة عندما تعبر الحدود، ولا تكشفني للجنود عن مخالبيك، لا تحدقي إلى أسنانهم الناصعة البيضاء. لا تتذمري من حال هذا المعسكر حيث لا شيء سوى الوحل والبرد. لا تحنّجي عندما تخرجين إلى العمل، ولا تنقي بالإيماءات الودودة، فلن تجرّ علينا سوى المتاعب.

لا تُكرّري أنك توذنين لو ترجعين إلى البيت، ولا تضعي كلمات لأمنيائك، إذ لا أحد سيكرّث بها. لا تسالي عن أبيك، فحنن محظوظتان ببقائنا على قيد الحياة، ولا أعرف أين هم أصدقاؤك. أتقني اللغة بسرعة، إذ لن تحققي شيئاً إذا كان لفظك رديئاً.

"نصوص"



الأخضر بركة قطعان الغيوم

بسكينة من وميض
يحزّ الرعد
أعناق السحاب
ما أكثر الخرطى حين تعده
لكته في ذوق بعض الناس
هايكو
النات معطوبة
هل عاد القرش
إلى عضّ الجبال..؟

هنالك من يخلدون إلى النوم،
وهنالك من يخلدون في النوم.
نفتح دُرُج الصباح
تفاجئنا بقايا الليل فيه
مبعثرة كآزرار الملابس
تمثال الدكتاتور
على الكتفين أوسمة
من دُرُق الحمام
حرّ شديد
والنافورة تعبث
بالماء والمخيال
لخامس ديسمبر ١٩٦٣
إمرأة تلدني
أنا لست حاضرا
إذا لم تسنح،
فاكتب الشعر.....
قالت عفوان الهمس...

أريد أن أحضنك
كي نصرخ بالعشق معاً
جلال الدين الرومي.
أمد يدي لقطعة خشب
تصير نايا
جلال الدين الرومي
لا يلتقي العشاق في مكان
هم في أحضان بعضهم
طوال الوقت.
جلال الدين الرومي
الرمال رمال
أثار اقدامنا
تولد مخوّة
مهدة إلى باشو.
ليلة مقمرة
من حجرة إلى أخرى
تتبادل الضفادع الرّاب
عميقاً تمدّ ألسنتها
في البحيرة، دون أن
تشرب،
مصايح الكهرباء
لأنّ شفتيك غائبتان
أقبل الياقوت
لأتذكر
جلال الدين الرومي
كألة عود

الرمال أمحاء
الرياح لا تعترف
بتجاعيد أمس
العالم قبضة رمل
ما يتبقى في اليد منها
هو نصّ الهايكو
حركة الغربال
بين يديّ أمي
تطمئنّ العالم
الكهرباء، الماء، الهاتف
ثلاث رسائل فقط
ما أفقر صندوق بريدي



معراج القضية

فلورا قازان

فقرأه بجوع أحلامهم يمشون
على ارضفة الخيبة بأملهم يتسعون
هجير الضوء عكازهم بلا ظل يتقدمون
إن طرقت أبواب القصور يجوعون
وان رشقوا جسر العبور يذبحون
النهر عطشان كيف يشربون؟!
البحر غضبان كيف يبحرون؟!
أسارير السوسن والسندس
والخروب في المروج
برجمات الحقد احترقت .. كيف يتعطرون؟!
وأزاهير اللوز والزعر والعكوب في الحقول
بطائرات الخيانة ترمدت .. كيف يصمدون؟!
أخبريني يا أيتها العدالة المنفية
إرهاب هذا القهر يسمى
إن حمل الحجارة و حرص أهل القبور
وجرم لا يتغير على هذا الشعب المقهور
إن تمرد وانتفض وصرخ بأعلى وجهه
يا قياصرة العرب يا عراة الكرامة يا بني صهيون
فحيح أصواتكم مشلولة ، مشلولة كلسان شارون
مزقوا هوية الزيتون وارفعا نعش وطن الليمون
ومن ثم ناموا حفاة الضمير
بلا ذنوب ، بلا شجون بلا عيوب ، بلا عيون
ها نحن بسواعد الاسود كالفقور نحو قبورنا
وحق القضية المحقة ودماء الشهداء سانرون
وسلام عليك يا وطن من أمة العرب مطعون !!



Sergotar

Wek Ramiyaran Dihatin Naskirin,
Niha Wek Qeşmeran Tê Naskirin

Penda Erebi dibêje:

“Ez û birayê xwe li ser kurmamê xwe, û ez û kurmamê xwe li ser xerîban”

Mixabin di van qonaxên hestiyar de ku Rojhilata Navîn tê re derbas dibe, û bi taybet di her çar parçeyên Kurdistanê de yên ku ji bêitirî 100 salî ve ji hêla rêjîmên Erebi û Tirk û Faris hatine dagirkirin, em dibînin û dixwînin ku em Kurd bi yên xerîb re diji birayê xwe disekin, ji xwe çiroka kurmam ew ne di rojevê de ye..!

Gengeşeya vê mijarê bêitirî li serê wan kesên ku berî Bihara Erebi vêkeve, dihatin naskirin wek nivîskar û ramiyar di nav gelê Kurd de, bi dehan nivîs, vekolîn, roman, gotar di mezintirîn rojnameyên Erebi de dinivîsandin, û doza Kurdî ji xwendevanê Erebi re didan nasîn, û bi pisporî xwe nêzî hemû mijaran dikirin, û di heman demê de ewan rojnameyan ji bi zaniyarî û pisporî nivîsên wan nivîskaran diweşandin, anku mijarên ku yekser serê hikûmet û sponserê wan dêşandin nediweşandin, û carnan ji nakokî diketin dinav siyaseta hin dewletên Ereban de, yan ji siyaseta hin dewletên Erebi diji siyaseta dewlata Tirkîyê û Îranê dihat, wê çaxê netenê ew nivîsên wan ramiyaran diweşandin, lê belê ji wan re werdigêrandin zimanê Tirkî û Farisî jî, ji ber bercewendiya wan û ew qonaxa nakokiyên ew dihat xwestin. Her kes vê mijarê berçav dibîne, û rojane di navdartirîn rojnameyên Erebi tîn weşandin.

Ka em berê vê mijarê bidin, şoreşa ku li Sûriyê vêket, Kurd jî di qîra yekemîn de beşdarî vê şoreşê bûn. Lê mixabin gelek pênûsên ku me ew di bin navê ramiyar û nivîskarên ast bilind de dihesibandin, xwe tevî piştigiriya şoreşa gelê Sûriyê nekirin, sedemên wan ên veşartî hebûn û eşkere jî dihatin xwendin, em karin vê jî ji we re şirove bikin.

Hinek ramiyar û nivîskarên Kurd ên li welêt dijîyan ji piştigiriya şoreşê ditirsyan, û di mejiyê xwe de digotin kî dikare vê rêjîmê hilweşîne, û çaxa ku dinivîsandin jî xêza veşerê di nivîs û gotara xwe de distandin, di heman wextî de hinek nivîskar û ramiyar hebûn, ji berê şoreşê ve, koçber û biyan bûbûn, ewan jî, xêza veşerê di nivîs û gotarên xwe de dihiştin, û wan jî di mejiyê xwe de digotin, ku pir zor e ev rêjîm bê hilweşandin, û ewan hesabê veşerê û serdana Sûriyê dikirin.

Piştî ku 5 sal li ser şoreşa gelê Sûriyê û şoreşa gelê Kurd ku ji bo hebûn û azadiyê vêket, rojane em dibînin ku ew ramiyar û nivîskarên tirsonek nivîsên xwe di rojnameyên Erebi, Tirkî de diweşînin, û jehr û gemara mejiyê xwe li diji birayên xwe yên Kurd ku niha di dema herî hestiyar de dijin diweşînin.

Ew di wî mejiyê xwe yê genî de diramin ku ew ji bo bercewendiya gelê Kurd dinivîsin, lê nizanin ku ew rojname nivîsên wan ji bo têkçûna xewna Kurdî diweşînin, û ji bo xwendevanê Erebi, Tirk, Faris, bi nerênî li pîrsa Kurdî binerin.

Ew di nav gelê xwe de ramiyar bûn, niha bila vê tiştê bizanin ku bûne qeşmer.

Seydayê Keleş

1930-18.6.2007



...ف...

Sêyemîn Festîvala Kurteçîrokê Ya Bi Sê Zimanan Li Rojavayê Kurdistanê Bidawî bû

Di roja Duşembê, şeşê meha Pûşber/ Yonyo de çalakiyên Sêyemîn Festîvala Kurteçîrokê ya li Rojava û li bajarê Qamişlo, di bin çavdêriya Desteya Çand û Hunerê li Kantona Cizîrê, li navenda Mihemed Şêxo ya çand û hunerê destpê kir, bi amadebûna bîrek ji rewşenbîr, nivîskar, helbestvan, nûnerên Rêveberiya Xweseriya Dimuqrata, û hin nûnerên sazîyên ciwanan.

Di destpêkê de, xuleyek bêdeng li ser gîyanê Şehîdên Şoreşa Sûrî û Rojava rawestyan, dâw re serokê encumena çibîckirîne li Kantona Cizîrê Ebdilkerîm Sarîxan gotinek ji bo wê helkeftê xwend, tê de li ser gîringiya çalakiyên bi vî rengî rawestiya, û lehengiyên Şehîdan, û berxwedaniya ku Yekîneyên Parastina Gel (YPG) dikin di bir de anî, û di dawîya gotina xwe de serkeftin ji Festîvalê re hêvî kir.

Seroka Desteya Çand û Hunerê Bêrivan Xalid ji hêla xwe ve diyar kir ku gelek beşdarî ji Rojava hene, Yekîtiya Rewşenbîrên Ereb, û Yakîtiya Suryanî ji tevli Festîvalê bûne, herweha gelek beşdarî ji Ewropa, Başûr û Bakur ji hene.

Xalid tekez kir ku mebest û armanca me ji vî Festîvalê ne wergertin pile û xelatan e, lê armanca ew e ku kurteçîrokê wek hunereke bi nîrx were nasin.

Endamê Komîta Amadekar Noşîn Bêcîrmanî di gotina xwe de ya bi navê komîtê got: " Hemû beşdariyê ku ji me re hatin qebûl nebûn, beşdarî tenê 55 çîrok bûn, 30 ji wan bi zimanê kurdî (Kurmançî) bûn, 2 bi zaravê Soranî, 25 bi zimanê Erebî, û 18 beşdarî ji derveyî Rojava ji hebûn.

Herweha Bêcîrmanî destnîşan kir ku her sê çîrokê di asta yekê û didwan û sisyan de, û ji her sê zimanan, Kurdî, Erebî, û Suryanî wê werin xelatkirin.

Çîrokn ku bi zimanê Kurdî di Festîvalê de beşdar bûn ev bûn:

- 1- Kalo û zarok - Yezda Havîn (Bakur)
- 2- Kevokên Raman - Cano Mihemed Eli
- 3- Fîstîvala Tahiro - Kawa Şêxê (Oropa)
- 4- Dibe ez vegerim (Yabo-Yadê) - Mihemed Şefîq Brahîm
- 5- Ezê werim Mal - Fatma Ehmed
- 6- Kêliyên di navbera jîyan û mirîne de - Zinarîn Diyar
- 7- Daweta her çend salan - Leyla Zêdo
- 8- Çîma? - Narîman Evdîkê
- 9- Welatê bê roj - Pêşeroj Cewherî
- 10- Şêr Şêr e çî jîne çî mîre - Behcet Lewend
- 11- Şêro çeleng bû li evîne reben bû - Raman Hîsî
- 12- Lawkê Delal - Cemal Birincî Oxlû (Bakur)
- 13- Sê kulîkên YPJ'ê - Aras Hiso (Kobanê)
- 14- Ma ya min çî ye - Milad Ismayîl
- 15- Hîskîrîna welat tu sinoran nas nake - Refîq Ibrahim
- 16- Zîman ji bonajîyan - Adil Murad Ibrahim
- 17- Solek bi morik - Narîn Şêxê
- 18- Cêwîtiya Şer û bêdengiyê - Heysem Muslîm
- 19- Qeyik - Qehreman Hesen (Oropa)
- 20- Mala mirovê tembêl berî mala mirovê zalim xira dibe - Bêrivan Hesen Dodîk (Efrîn)
- 21- Terê baz û melekê Tawûs - Eyûb Gûven (Bakur)
- 22- Xewneke Şêrin - Îsmayîl Dîndar (Bakur)
- 23- Gûneh- İlhamî Sîdar (Bakur)
- 24- Rojek ji rêzê - Mehmud Çaqmaq (Bakur)
- 25- Zîlkîf û Xezal - Ebulrehman Bakîr (Bakur)
- 26- Keziyên ji bêhna rihanên kes-

keyî - Roza Metîna (Bakur)
27- Reg - Kakkem Botanî (Başûr)
28- Daweriwanî- Umer Hisên Hisên (Başûr).

Çîrokn ku bi zimanê Erebî di Festîvalê de beşdar bûn ev bûn:

- 1- Şamîram Terka mala Xwe Dike - Hela Ferîdon
- 2- Bajarek û mirovek - Hena Hena.
- 3- Welatek Ji Bo Kirê - Henan Reşko.
- 4- Selwa û Yasmin - Henan Deqorî.
- 5- Kaxezên Xwediyê Şikeftê - Ehmed El - Eli.
- 6- Riwek spi..Riwin Reş - Munîr Şem`ûn.
- 7- Jîyan - Du`a Sîrac.
- 8- Dibe Ku Xewn Be - Hêwa Betal (Efrîn).
- 9- Heval û rastî - Rena Mihemed Se`îd.
- 10- Zarokên Şer - Mehmûd Silêman Mihemed.
- 11- Mişextiya Ber Nîvro - Ibrahim Cîrcîs.
- 12- Roja Sabîr - Eli Mustefa Elîbrahîm.
- 13- Çîrokek Evin û Qurbaniyê - Mihemed Xelef Siwêhil.
- 14- Keçek Anî - Kewser Mardînî.
- 15- Wêran Diaxivîn - Ezher Dawud Ehmed.
- 16- Îsa û Hebab - Ebîr Hena.
- 17- Biranînên Noqbûyekî - Ebdilrehman Mihemed.
- 18- Ji Keça Min a Pakrewan Zelal Re-D. Peyman Aydîn.
- 19- Veşartokên Gîyan - Cala
- 20- Nîsana Mirîne û Qiyametê - Hena Somê.
- 21- Şaneşîna Çîya û bedewiyê - Lamar Erkendî.
- 22- Gera Li Besma - Saman Hacî Hesen (Ewropa).
- 23- Li Kobanî Hêvî Ji Bîlî Hêviyê Tune - Selahîdîn Muslîm (Kobanî).

Roja Şeşan ji Sêyemîn Fetivala Kurteçîrokê Li Rojava roja dawî bû, û tê de çîrokn biserketî hatin xelatkirin. koma navenda Mihemed Şêxo gurzek ji stranên Erebî û Kurdî yên kevin pêşkêş kirin, dâw re dilanek ji filîklorê Suryanî ji hêla Koma Bermaya hate pêşkêş kirin, piştêre Şanoyek kin ji hêla koma Navenda Mihemed Şêxo ya Şanoyê hate pêşkêş kirin.

Koma Martosa govendek filîklorî pêşkêş kirin, û ji hêla xwe ve hunermendê mezin Beha Şêxo gotinek bi vî helkeftê got, û tê de spsiya her kesê ku bi vî erkê han rabûn û ev Festîvalî lidar xistin û bi ser xistin, herweha silavên xwe ji bo kesên ku niha li eniyên Şer di çeperan de ne û parastina me dikin sand û spasiya wan kir.

Di dawî de bawernameyên rêzgirtinê li hemû kesên beşdar hatin belavkirin. çîrokn xelat wergirtin ev bûn:

- Di zîmanê Suryanî de: Hena Hena - Hena Somê - Ebîr Ilyâ.
- Di zîmanê Erebî de: Du`a Sîrac - Ebdilrehman Muhemed - Hêwa Betal.
- Di Zîmanê Kurdî de: Zinarîn Diyar - Kawa Şêxê - (Roza Metîna ji Bakur - Aras Heso ji Kobanî).


Derbarê Festîvala Kurteçîrokê Ya Sêyemîn Li Rojava Bêrîvan Xalid Seroka Desteya Çand û Hunerê ji rojnameya Buyerpress re diyar kir û got: " Ev roja dawî ye ji Festîvalê, me rojî xweş bi hev re derbas kirin, her çîrokek ji çîrokn ku hatin xwendin êşek bû, hêviyek bû, û berxwedanek bû, lewra eger Festîvala vê salê û ya sala bûrî bidin ber hev, em ê binerîn ku ya isal gaveke xurtir bû, çîrokn astbilind tê de beşdar bûn, û em hêvî dikin ku ev sal ji wek ezmûneyekê ji bo sala di be, herweha em hêvî dikin ku Festîval di pêşerojê de berdewam be, û bi hêzeke xurtir.

Endamê Komîta Amadekar Telal El-Şêx ji hêla xwe ve diyar kir ku ev Festîvala amade kirin û çîroknivîsin ji bajarê Efrîn, Kobanî, û Başûrê Kurdistanê de beşdar bûne Festîvaleke serkeftî bû, tev ku gelek astengi li pêş derketin, ji ber ku gelek ji nivîskaran şert û mercên çîrokê yên ku me ji wan re ragihand pêk nanin, hinek

ji wan çîrokn wan dirêj bûn, ne di asta kurteçîrokê de bû, lê ez dikarim bibêjim, ku Festîval bi giştî serkeftî bû.




El-Şêx wisa ji got: " Me - wek komîta amadekar - ji berî destpêka Festîvalê bi pazdeh rojan dest bi amadebûnê xwe kir, vaye em iroj digihêjin dawîya wê, rojî xweş bûn, me bi guhdarkirina çîrokn curbecur derbas kirin".

Festîvala çîrokê yekem car di 6/6/2016an de di bin çavdêriya Yekîtiya Nivîskarên Kurd de û bi navê Festîvala Çîroka Kurdî destpê kir, ji ber di 6/6/1913an de yekem çîrok ji hêla nivîskarê kurd Fuad Temo ve, li ser du xelakan di kovara "Roja Kurd" de,



li Istenbolê hatibû weşandin.

Di salên 2015-2016an de Desteya Çand û Hunerê li "Kantona Cizîrê" bi kar û barê Festîvalê rabû, û isal navê wê kir "Festîval Kurteçîrokê Li Rojava", û çîrok bi sê zimanan tê de hatin xwendin, Kurdî, Erebî, û Suryanî.



Helbestin Bijartî Ji Dîwanên Seydayê Keleş

Seydayê Keleş angî bi navê xwe yê din Hesên Mihemed an Mele Hisênê Bizgûrî di sala 1930'î de li gundê Bizgûrê yê Mêrdînê ji dayik bûye. Di 6 saliya temenê xwe de bav û diya wî diçin ber dilovaniya Xwedê, ji feqîrî diçe Binxetê.

Bayê li me da dane ber xwe û revandin
Sed kaş û newal dîr û diêj em qulipandin
Em bûne kelem ku li ber bê diravin xêş
Pîj û keleman kincik û cilkê me qetandin
Canê me hemî xêzk û teriş sorbûn ji xwîne
Xîp û diriyar her derê laşê me çirandin
Gazî û hewar nalîn û qîr pir ji me çûne
Pêçî û nenûk ji dest û nîgan tev de revandin
Noq bûne newalan ser û çogê me dibên hûr
Himê kevîran dest û nigên me va revandin
Enya me li tehtan dikevî şingîn û şerqîn
Ev poz û diran dev û bêvil tev tîkandin
Sed tîş û birîn va ne dilaşê me ve bûne
Vê êşê û vê janê hinavê me hilandin
Xwîna me li herder dirêjî rêz û şerîpan
Zanim ku neyarê me li me ser digêrandin
Taldek ji me re nîne ku em zû bidin ber xwe
Tim ba û zeber tê li me em dane gerandin
Ev ba û birûsk tev de ji bo me bi xezeb tê
Fîz fîz dikî bend û dîwar tev herifandin
Birçî ne em tazî ne hemî mane perîşan
Berê xwe didun kû deverê em ne hewandin
Bayê bi hiner em birine welatê xelkê
Destên me ne girtin û ji nav xwe qewitandin
Kurdên me li welêt ma ne perîşan
Bêbava û xwînxwara millet tev şewitandin
Qirdê me çima waye ku em bê ser û ber man
Zordar û sitemkara millet tev pelixandin
Em bûne heşa reş ketine nav dilê xelkê
Kedxwara û serdara millet vaye mirandin
Faşista welatê me kirin perçê û parî
Peymana welatê me hemî tevde çirandin
Xortên me ji xew rabin werin hevdu bibînin
Da şopa neyar ji roj hilat bête birandin
Destên xwe bidin hev û bibin yek di lû perçê
Da riknê neyar tev li welêt bê herifandin
Kabûsê mezin ketiye welatê me bi zorê
Van şêx û melan beg û axan em weitandin
Bê hiş û serî her dem li pey wan dimeşin em
Sed salî li ser me xwe bi vî rengî meşandin
Ma kengî xwedê wer gotiye divê li pêş bin
Em kurdên reben tenê bi van hatin xapandin
Ta îroj nokerin xwe ji bin bînin derandin
Mejyê me bi zîngarê genî hate veşartin
Pir sal û zeman jê re divên bê xerutandin
Kurdên me divê tevde ji vî xewê şiyar bin
Xwîna me divê li ser çiyar bête rijandin
Bese Kurdo

Bese kurdo hey heware razan ne ma ye
Her kes bo xwe kar û bare bo çî tu maye
Dengê cenga çîhan kurdo ma na bihîzî
Li her derê bîner kurdo agir dilîzî
Cenga tang û toran kurdo ma tu nabînî
Li ser çiyar tu çekdaran çîma naşînî
Nema êdî xew tê kurdo nikarim razim
Şûreşgêr û xwendivanan ji te dixwazim
Heta kengî tê bîminî birçî û tazî
Millet perîşane kurdo azadixwazî
Rêça azadî bixwaze jê venegere
Van ristikan pir bi xwîne û lê venere
Ev ji te tê xwestin kurdo gelkî bixwîne
Şopa xurt û zanebûnê tê xweş bibîne
Li meydana şeref rabe bike xebatê
Şerê dimîn bike kurdo têkev lebatê
Paşverûyê çîhan kurdo te vde ne dostin
Tev de dizin bo xwarina tev malpostin
Kurdo rabe rê de bigre bo xwe bide ser
Şerê dimîn bike kurdo rabe li herder
Were bo te bêjim kurdo rêya azadî
Bo welatê xwe tu negrî bibî dilşadî
Li bin destan bes bimîne va em xerabûn
Li ber dijmin dest hilîne va gel tev rabûn
Şiyar bibin kurdo rabin tev de mîr û jin
Êrîşî neyran bikin tev da bikujin
Kesî ne hêlin li ber xwe ta yek nemîne
Welatê xwe tevî bixwe û lê bimîne
Neçe derve ji xelkê re rebin xulamok
Li welatê xwe bin kurdo bibin reh kok

TEV BIBIN XWENDA

Bi şev û bi roj herin dibistan
Li paş nemînin tev bibin xwenda
Divê herin pêş Kurdên jêr û jor
Tevde bi xwînin da nebin wenda
Şev tarî û eş herdem li ser me
Bibin hevalên şiyar û rinda
Tariyek dirêj qe nabe ruhî

Kurdên belengaz man li nependa
Destên hev bigirin herin bo rewşen
Êrîşkin dijmin vemalin zenda
Partîkê çêkin bi sûnd û peyman
Kurdan bikin yek bajar û gunda
Li pêş xwe deynin yê zana û jîr
Komîtan çêkin ji hinermenda
Ev bûdusedsalemanneblindest
Ji bo xwe vêxin agir û finda
Li Kurdistanê hûn bibin xwedî
Heqê weye va mafê we wînda
Werin bi carek destan bidin hev
Bi ramanek rast têkevin benda
Divê herin pêş gelê Kurd hemî
Li bajêr û gund tev nebin wenda
Ji bo te divim tu bibe dewlet
Dewletek Kurdî xurt bibî peyda
Ji GUND BIÇIN ŞARISTAN

Ji gund diçim şaristan

Li Binxetê, di temenê 10 salî de, dest bi xwendina olî kiriyê, di sala 1945'an de, dest bi karê welatparêzî û xwendina kurdî kiriyê û dan û standinên wî bi rewşenbîrên wê hingê re çêdibin wek Cege-rxwîn, Qedrî Can, Mele Ehmedê Namî û Seydayê Tîrêj û bi wan re dest bi hunandina helbestê dike.

Ji bo bibim xwende van
Paş ketin bixwînim
Da ez nebin perîşan
Nexweşiyê hilînim
Da ku wê bi hilînim
Tovê xwe lê biçînim
Li bajar û li gundan
Bibim hozan û rêber
Ramana xwe bibim ser
Şev û roj lê bigerim
Welat vegrim sera aer
Bi edatê bankim
Millet ji xew şiyarkim
Ta biçûkan bi kar kim
Dema weye tê herin
Rabin herin ser çiyar
Vegrin xax mîdiyan
Li cîjanê degn bidin
Nebîn wekî sêwîyan
Destên xwe tev bidin hev
Pevre rûnin roj û şev
Dema ji hev hez bikin
Dijmin wê tev bikin rev
Qadê ji wer bihêlin
Wana tevan bi şêlin
Tevde hûn kêf xweş dibin



Ne xweşiyê nehêlin
Barê we sivik di be
Derdê we hindik dibe
Dema ku hûn herin pêş
Ruhnî û fîndik dibe
Ser xwe bûnê bistûnin
Dil xweşiyê bibînin
Êrîşî dijmin bikin
Heyfa xwe jê hilînin
Nema derdan bikîşînin
Qeydan ji nig bişkînin
Dijmin divê der kevin
Xwîna xwe lê birjînin
Azadî gelkî xweş e
Herdem me dil pê geşeBi zarê xwe bi xwînin
Bi kokê re bi meş e
Hûn hilgîrin vî barî
Dijmin bi me nikarî
Kurd hin xurttir dibin
Şax bidin her kenarî
Divê em dest hilînin
Xwe ji bin destan derînin
Welat bikin wek cinnet
Dijmin ji ser hilînin

EZ Û YAR

himbêz kir û keç me dest lê gerand
Ji zora me biş koj hemî tev fitand
Me xweş rahejand û ji herdu Milan
Me destên xwe kir hunurên paxilan
Me nijt av ji lêvan me dil lir tijî
Ji hiş çûm bû me berda mejî
Kenî keç bi hêdî di got min kuro
Fehete li derve were hundiro

Bi carek te perde memî tev çirand
û kolos tev gindirand Te kofi
Zimanê xwe ji bigre van gotinan
Te gul tev weşandin ji van sosinan
Te bexçe xerakir bidîni ketê
Nehîşt ku pêwan bikin nobetê
Te tev dane erdê ku sênc û çeper
Na hiştin te bend û dîwarên li ber
Te tev hilweşandin dîwarên ewî
Ne hiştin te sênc ne û mêwîn tîrî
Te tev dawêşandin bihok û hinar
Te tev qurmiçandin û kulîk buhar
Nehîştin te morî û mircan û kil
Ji reng tev ketin por û hîbrî cil
Bihevte ji qamê li erdê ketin
Nema bîr dibim em hev daketin
Te kir wek peza ku gurê har li ser
Hemî der te xêzdan ji nig ta biser
Me kirt bi hevte me soz daye hev kolimv
Civanek me dahev li pişt gund bi şev

Emê hevdû bigrin bibin ser çiya
Bibin pîrs girêka gel û gndiya

LALO HEVALO

Ez yek dibêjim kes nedî
Ji bextê xwe reş tir min nedî
Lalo bira wer lê binêr
Da anbin tev de gidî
Çil sale min qîr û hewar
Armanç û nişaneke didî
Her lê di şev û roj
Xwe lê didim sed ji sedî
Hêvî û daxwaza mine
Rizgar bikim vî beledî
Dema şiyar bin Kurd hemî
Li Kurdistan dibin xwedî
Bextê me bê ol û kirêt

Ji ber ku wî ji biçûkaniyê ve, gelek zîlm û zor dîtibû û gelek çûreyên kar û xebatê ji bo bîdestxistina pariyê nanê xwe û zarokên xwe kirîbûn; ji cotkariyê, şivantiyê, palayiyê û avakirina xaniyan, ji ber van yekan, piraniya ristên wî bi dijwari û xurtî êrîşî zordestiyê, sitemkariyê û bîndestiyê dike.

Herkes va me wirde didî
Kesnabi seyda ev li min
Hertişt xuyaye va wedî
Pir sal û dem beyhude çûn
Destek ji bo xwe me nedî
Destê me vala ye ji lew
Ger nev weba min rê didî
Ez çibikim destê min kine
Naghîje ber devê xwedî

Destê şikestî bin kevir
Janê ji nava dil didî
Jana min û gel tev yeke
Rojek me xwe dil xweş nedî
Ez ban dikim mîr û jinan
Can û ceger tev tê didî
Meydan li ber mêran giran
Dem va ye bo te rê didî
Hespê sipî bende weye
Hey hey bi zengo lê bidî
Mêrxas û yê pir jîr divên
Bi tîrs û bêş erm û fedî
Ger em nekin wê kî bikî
Di ber tede wê kî bidî

Gerdena nazik

Gerdena nazik ji rîhanê ne de ber pencerê
Bejn û bala tey tenik tîrsim belak jê re derê
Zilf û xalan tu veşêre ebrû çavan ber ne de
Nabî kes vana bi bîni û li wana bi nerê
Porê zer sor û dirêj qet min ne vêt ba lê bidin
Mîna şitla şox û şengê bejn û bala esmerê
Ev surra bayê seher pê re hezar êş û elem
Vê qebûl nakim tu caran ji wê bîrcê tu derê
Dergevan im bendewar im mal û halê min tu ye
Vî dilê Seyda ditîrsim tu bi dî ber xincerê

Seydayê Keleş Xwedî 8 dîwanên Helbesta ye. Ji Dîwanên wî yê çapkîrî: Em û Dijmin - Rêka Gel - Derdê Millet - Ronahî - Xebat - Gotinên Pêşiyar. Yên destnivîsê sê dîwan û bîranin e: Helebçe - Berbang- Baxistan - Bîranînên Min. Di roja duşemê 18.6.2007an de koça dawî kir û li goristana Qedrî Beg hate veşartin.

Ji birînan pir ditîrsim ger bi çin nêv cerg û dil
Wê hinavan bidne sotin tev bi carek her derê
Min nexenêv kul û derdan min berê dil tijeye
Ji neyaran pir di tîrsim ko bi çin koç û serê
Min nevetin ku hinek bîn bi bûrin çav li te kin
Wê demê êş û elem xurtin li nêva cegerê
Ev neyar ger te bi bînin wê bi sojin vî dilî
Tê belakê bo mî çêkî di be ku can tê herê
Her neyar ji min di tîrsin û ji ber min direvin
Lê li ber te xûz û xwarim ma li min tu na nerê
Xet û xalên qelemî dijmin di wan na buhurin
Pir ditîrsim ku ji dest min herî find û fenerê
Nazik û şêrîn û rindê ser û surra periyar
Ser me danî ber piyên wê pût û lat û mehderê
Bejn û bala te ye taze wek çînara zeviyê
Nêrgîza sîka zinarê ney û naya deverê
Nazika min dilbirîn im ji xem û derd û kulan
Ka li halê min binêre bide min yek xeberê
Min ne xoş im mest û gêj im sebir û saman
im ne ma
Ez ditîrsim ku nemînim ne bînim qozeqerê
Şerbeta şêrîn ji lêvan ez dînoşim şev û roj
Aşiqê bejina bilind im zêr û durr û gewherê
Tu ye hêl û hinera min bi te bawer min heyê
Min ji kalî ve digêrinî bîstûpêncê salî berê
Kaniya ava heyatê kî vexwî wê her bijî
Pê dibim mîna Ebanos ta bi sed salî derê
Wê ji bo min her bimîni ser bilind û payedar
Tac û textê min ji zêrin sînga eywan û serê
Te bi lawê Sîna nadim ne bi Luqmanê hekîm
Tu ye dermanê dilê min wê bi te ruh veqerê



Peyva wendayî

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	B	U	H	I	Ş	T	Ê	N
2	D	H	O	R	I	Y	A	A
3	E	A	W	H	T	Ê	V	V
4	R	A	E	I	M	E	Ş	Û
5	K	N	K	L	T	Ê	Ş	D
6	E	Î	A	M	J	I	E	N
7	T	B	G	U	L	A	W	A
8	G	U	L	A	N	R	X	V

Peyva wendayî ji 5 tîpan e, meheke salê ye. Ji nav gula derket meş tê, wek horiya nav buhiştê, gulan hilm û bîna xweş tê.


Bersiva peyva windayî 44: Sitem.



Mamik

- Ji kelhê diavêjim naşkê
- Diavêjim avê dişkê
- Elî hema
- Pez berda çema
- Heta sibehê
- Rabû kit jî nema
- Ser mazî ye
- Stû derzî ye
- Ber kaşa ve bezîye
- Kir hewar û gazîye

Bersiva mamikên hejmara 44an
Jûjî - Nexşe - Ziman



pend

- Tiştê bi nêvî jê bib bêhêvî .
- Tu kes ne bi halê ca zave ye .
- Wek hehecîka tim devê wî ji hev e .
- Xwedî malê xwe be û şêrinê ber dilê hevala be.
- Xwarna Kurmanca ya nan û dew e ya dan û dew e .
- Xala xwarzê rakirin û apa birazê dakirin .
- Nigê şemîtî hevalê wî tune .



	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2								
3								
4								
5								
6								
7								
8								

- Asoyî:
- 1- Xwediyên pêdiviyên taybet.
 - 2- Jimarek e, bi şev li asîman e.
 - 3- Agir, dadwerî (bi Erebi).
 - 4- Bi ser agir dikeve, nîşaneke nebîna, wekhev.
 - 5- Peyam.
 - 6- Zanîn.
 - 7- Di hundirê dev de ne, wekhev.
 - 8- Ji bo çêkirina hevîr, Nok.
- Sitûnî:
- 1- Ji gelên rojhilat, ji bo pevgerêdana hevokan.
 - 2- Dayik(vajî), tersî kevn(vajî), wekhev.
 - 3- Serbest.
 - 4- Xudanê şer li ba Zerdestîyan.
 - 5- Ji bo neyînîyê, tersî girî.
 - 6- Cejn(vajî), ji dengêran.
 - 7- Meheke salê, ji jimaran.
 - 8- Doxîn jê çêdibe.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	X	A	L	X	A	L	O	
2	A	R	Î		F	A	T	Ê
3	Ç		D	A		D	O	Z
4	O	L		L	A	N	F	I
5		Î	S	A		E		K
6	A	L	A	N		M	A	
7	L	A	W		E		R	Û
8	A	V		H	E	V	D	Û

Xacerêz
Bersiva hejmara 44an

Alboma Hunermen Kerîm Şêxo Ya 2016an Derket

Kurdi Xwesh e

- şiyar<<<< مقدره
- dirûv<<<< ملامح
- akar<<<< أخلاق
- rasteqîne<<<< مصداقية
- bednav<<<< سيء الصيت
- kejal<<<< أشقر
- binar<<<< سفح
- soma<<<< حدقة العين
- Keçbanû<<<< امرأة عزباء
- Şevpest<<<< كابوس
- Kurtepişt<<<< همس

Di van rojên bûrî de alboma hunermend Kerîm Şêxo ya sala 2016an di bin navê "Şop û Evin" derket.

Hunermend Kerîm Şêxo di alboma xwe de 6stran kom kirine, mijara stranên wî evîni û civakî ne. Li gor ku Kerîm Şêxo li ser rûpela xwe ragihandin, ku ew î piştî çend salan ji rawistana weşana alboman, ev stran bijartin, û hemû bala xwe da mûzîk û belavkirina wê di vê albomê de, û piranya akîpa ku di vê albomê de pê re kar kirine pîspor û mûzîkjen in.

Srtanên Alboma Hunermend Kerîm Şêxo Ev in:

- Lê Lê: Awaz Kerîm Şêxo - Gotin Ehmed Bavê Alan
- Negrî: Awaz Kerîm Şêxo - Gotin Kerîm Şêxo
- Xemê: Awaz Kerîm Şêxo - Gotin Şepal Hévo
- Rondik: Awaz Kerîm Şêxo - Gotin

Şepal Hévo

- Li vê de: Awaz Ehmed Bavê Alan - Gotin Ehmed Bavê Alan
- Keçkokê (Folklor)
- Ûd û Cimbîş: Selcuk Isbir
- Gitara Klasîk: Ayhan Tutlu
- Gitara Bas: Savaş Pamubuk
- Qanûn: Firas Şahristan
- Kewele û Ney: M.Ibrahim Daylın
- Keman: Ahmet Bikcan/Ismail Campi/Reza
- Qernate: Tekin Ouz
- Klarinêt: Suleyman Ors
- Pirkêşin: Yildiray Mulayim
- Tembûr/ Alêktro: Hesen Saz
- Mastring: Sinan Bozan
- Mîks: Semir Hisên
- Dizayin: Qasim Derwîş
- Foto: Noşin Malek
- Vîdyo: SakoGroup

